BUHA: 10 TL (10 Lira, KIBRIS 15 TL) No4 ÇILE (OCAK) 2020 KURMANCÎ




www.arsivakurdi.org







www.arsivakurd.org


kovarazring@gmail.com
instagram@kovarazring
twitter@kovarazring

**Siyamed Reklam**
Fırat Mah. 499. Sk. Yüz evler 39 No:7 AR
KAYAPINAR / DİYARBAKIR
**İmtiyaz Sahibi:** Bişar Durgut
**Sorumlu Yazı İşleri:** Rojhat Bilmez

**Reklam ve İletişim:** 0 (544) 672 96 61 **ISSN:** 2687-3567
**Dağıtım:** Turkuvaz Dağıtım Pazarlama A.Ş.
**Baskı:** Ezgi Matbaacılık San Tic Ltd Şti **Adres:** Sanayi cad.
Altas sok no:10 Çobançeşme, Yenibosna, Bahçelievler
**Yıl:** 2019 Sayı:4 Yayın Türü: Aylık yaygın süreli yayın

Zring dergisi'ndeki çizim, espri, yazı ve kullanılan karakterlerin yayın hakları saklıdır.
Yazar ve çizerlerin yazılı izni alınmaksızın hiçbir yazı ve bası görsel yayın organında ve sanal ortamda kullanılamaz.


QIRIX
MALA KEKO
SERSALA NÛ AN SERSALA KAFIRAN?
ÎŞEV NE YASAX NE JÎ HERAM, WÊ NIKARIBIN KÊFA ME BIHERIMÎNIN. AHA EV JÎ PÎROZBAHIYA ME YA ALTERNATÎF E
HELAL BE JI ME RE, TENÊ TELEVÎZYONA ME KÊM E.
LI JÊR DERDÊ BAVO NAYÊ KIŞANDIN. QOLA Û PATATÊ MIN JÎ HENE, MA HÛN MIN JÎ NAXIN NAV XWE?
NALET LÊ BÊ, HETA EZ DERDÊ KESÊN MUHAFIZEKAR BIKIŞÎNIM, EZ Ê BIÇIM CEM GELÊ XWE Ê LUMPEN HÎN ÇÊTIR E ÛLAN!
KUTOOO !..
"YEK DIN JÎ LI ME ZÊDE BÛ. KA BÊJE MIN, LI KU, TE LI KU VEŞÊRIM. BI XÊR Û XWEŞÎ HATÎ BIRAZIYÊ ÇETO"
TU Û SERSALA XWE YA HERAM!... BELA TE VÊ NÎVÊ ŞEVÊ GEDÊ MIN BI ÇOLA KETIN, ZALIM!
DAYÊ ?!...
XALTIYA BESÊ!
HER SAL NIZAM HERAM E NIZAM A XIRÎSTIYANA YE... NE XEMA ZAROKA YE. MELE FAÎK BÊJE ÇI EW E... 'HERAM'... ZALIMÊ ZALIMAN!
SAKÎN BE DAYÊ. HELA RAHÊJE VÊ Û RÛNÊ. BÊ HERAMÎ ÇI YE, EM BI RIHETÎ XEBER BIDIN. DEV JI WÎ ZALIMÎ BERDE, JI XWE RE NEKE XEM.
GRUM!
HIYEEEYT ÛLA! SERSALA TE YA NÛ PÎROZ DIKIM SILO!... Ê TE JÎ Û Ê BABA NOEL JÎ ÛLA! WÊ SALA 2020'AN BIBE SALA AZADÎ Û WEKHEVIYÊ ÎNŞALLA!... BIMRE DÎKTATORÎ!...
OY BISMILA! MESELEYA YASAX Û HERAMÊ ÊDÎ HILDIPETIKIN. XWEZÎ MIN JI BO ŞEVEKE BI QOLA-XAZOZ ÎZIN BIDANA. HAHO MIN ÇI XWELÎ LI XWE KIRIN!




www.arsivakurd.org

## SOSRETÎK




## MELLE





## TABLETÊN BEREDAYÎ




## DÎKÊ QOQO




www.arsivakurdi.org



TIRŞIK
EŞREF MUMCU
LAN GURGO! EV HEYRANIYA TE YA YILMAZ GUNEY HEYE YA ÎMAN LI ME ÇIKAND. MA DI DAWETAN DE Û WÊNEYÊN DAWETÊ BÎNA FÎLMÊ "RÊ" BIN? MA JI HIRIYÊ BALGÎFA BERFÊ ÇÊ DIBE? TE BALGÎF NEHIŞTIN BALGÎF! MA TU YÊ SERÊ XWE DEYNÎ SER KEVIRA?
MISTO, GEREKÎ EYNÎ EW SAHNE BE. GEREKÎ DI BERFÊ DE JIN LI PAŞ Û BERF HÛR HÛR BIBARE. GEREKÎ EV WÊNE XELATÊ WERGIRE.
KURO SERXWEŞOOO QENALÊN BELGEFÎLMA MASIYAN DIWEŞININ TEV WINDA BÛN. TU ÇI DIKÎ LI JOR? ZÛ BERÊ ANTÊNÊ BIZÎVIRÎNE.
KEÇÊ CA SEBIR KE ÛÛÛ.. VA DIZÎVIRÎNIM, Ê NIHA QENAL WERIN
OOX... ABÊ DEST Û PÊÇIYÊN TE TERR BIN. MASIYÊ MALABADÊ ÇI XWEŞ IN
HESO HÛN BI QEDRÊ XWEDÊ BIKIN DEV JI LÎSTIKAN BERDIN. ZÛ EM COTÊ XWE BIKIN BILA KAR NEMÎNE. EZ BETILÎM BI TENÊ ALÎ MIN BIKE LO
KURO HÊDÎ BAJO! LI PÊŞIYA ME ZINAREK QIRASE HEYE, TU ME NEKUJÎ!
NÊRGIZA MIN WELE JI TE PÊŞTIR TU KEÇIK NEHATINE MALA MIN. QEDRÊ XWE ZANIBE.
KIFŞ E KIFŞ. TU DIBÊ QEY LI VÊ GUR Û KÛÇIK PEV ÇÛNE. 12 LI MIN KETIYE, WELE EV KAR MEHKÎ JÎ XELAS NABE
WÎÎ EZ BI QURBANÊ KA BÊJE XALTÎ, BÊJE XALTÎ.
OXXX MEMMIK!
MEMIK Û MEMIK, HER TIŞT MEMIK. EV BÊNAMÛS NIZAM LI KÊ ÇÛYE?! JI MEMIKAN PÊŞTIR BI TIŞKÎ NIZANE, KUNDIRÊ KUNDIR
MIN QEYD KEVIN KIRIN JI HISRETA TE
BÊJE CINETIYO DÎSA BÊJEEE
MIN QEYD KEVIN KIRIN JI HISRETA TE
HAA HA! ÎCA ÇÊ BÛÛÛ
TE AHMED ARÎF BI ZIMANEKÎ PAQIJ QULIBANDIYE SER KURDÎ. EZ BI TE QAYIL BÛM. EZ ANCAX DIKARIM WISA BI TE QAYIL BIBIM
EZ NEXWEŞIIIM, QEY KES TUNE DERZIYEKÊ LI MIN BIXE?
TE EYB KIR HA! EZ BI XWE BI TEMAMÎ DERZÎ ME. KÎJANÎ DIXWAZÎ? A BIÇÛK A MEZIN? TU Û QÎMA XWE




www.arsivakurdi.org

OZGUR AMED





## ADÎÎÎ KAPÎTALÎZMM...

*Dema derî vebû û Miheme ket qawîşê, hema bêje berêvarê bû.*
*Mihemedê çavşîn yekî dirêj û zeîf bû... Baş nayê bîra min lê ji ber xayînekî li ser wî îfade dabû, Miheme hatibû girtin. Agir bikeve mala wî xayînî, li ser wî her tişt gotibû. Dema ku me digot, "Yaw ev çi mesele ye, çima dosyeya te wisa nepixandine û mezin kirine" li xweşa wî diçû û digot, "Heval em jî ne hindik in, ma eyb etmîsen".*

*Miheme di klasmana xwe de hevalekî balkêş bû! Li vê dinyayê tenê ji tiştekî hez dikir, ew jî kevok bûn. Çavên xwe dida ezman û ji dil digot "Axx axxx! Hema kevokek teqlecî an jî firfirlî, atlas, helebî hebûya û min ew xwedî bikira. Axx axx!"*

*Welhasil kelam...*
*Miheme di carekê de dikaribû behsa sed çeşîd kevokan bike. Xewn û xeyalên wî li ser kevokan bû. Lê mixabin di zindanê de kevok tunebûn...*
*Baş e, ku hûn jî bawer bûn bi hêzbûna wî, em êdî derbasî meseleyê bibin. We got erê?*

*Belê hevalên Romayî,*
*Ji Xwedê yeqîn bikin, piştî hatina wî, ya roja dudo an ji sisêyan bû!*
*Em li cihê nanxwarinê, li ser maseyê, bi hevalan re di nava nîqaşek wehşet de bûn...*
*Mijar kapîtalîzm e... Haa biraoo ha biraoo! Her gotin her analîz wekî guleyan diçe û tê!*
*Te dît di dawetan da dibêjin "Zar û zêçên xwe ji orta dawetê rakin!"*
*Bi şerefa Haco, kî bikeve nav vê nîqaşê wê çem û çem here! Rewşa me jî ew bû.*

*Êêê xwedê qebûl bike, Miheme hat ket nava civatê! Li ser kursiya plastîk rûnişt. Nexwe nîqaşa me pir bala wî kişand. Bi dil û can guhdar dikir!*

*Kapîtalîzm çi ye, ji ku derketiye, bêdestûr çûye ku, çima bêsinc e, ap û meta wê kî ye û hwd!*
*Dema ku min mafê axaftinê wergirt, nizam ji ku hat bîra min, min jî mînak li ser Adîdas û Nîke da!*

*Hilberandina van markayan çawa dibe, ji Çîn, Malezyayê çawa tê Qulpê û New Yorkê?*
*Ev tişt, temam. Lê min dixwest ez bigihîjim encamê, ev jî qezenc e. Kî çi qas qezenc dike di vê zincîrê de? Kesên ku solan çê dikin û kesên ku difiroşin, di navbera wan de çima ew qas ferq heye? Gerek em vê rewşê çawa binirxînin? Çima maeşê yekî ya mehekê, maeşê yekî din ya salekê ye?*

*Pirs li ser pirsan, ez agir geş dikim! Dema ku wisa diçûm, di aliyê Mihemed de livdarî dest pê kir. Ez sekinîm. Çimkî Miheme hêdî hêdî xwe kir binê maseyê û ji ortê winda bû. Em wisa matmayî li hev du dinêrin...*
*Hema bibêje deqîqeyek derbas bû!*
*Ahaa! Serê Miheme derket ji binê maseyê... Li me teva nihêrt! Em jî bi awayekî şaşwaz li wî dinêrin!*
*Piştre, destê xwê rakir, di destê wî de sola wî! Subhanallah!*
*Sola wî Nîke bû!*
*Solê rakir û got zriiingggg li ser maseyê xist... Îcar ev çi ye?*
*Her hal li xweşa wî çû, dîsa got zriingggg!*
*Ya star! Em hê jî li hev du dinêrin...*
*Miheme bi dengek bilind got:*
*"Hewaaarr! Bi telaq min nizanibû ev marka ev qas bêşeref in, ew qas adîî ne... Êdî ez nakim piyê xwê. Heval heval kapîtalîzm bêşeref e weleh bêşeref e... "*

*Me ew bi darê zorê da sekinandin û me navber da nîqaşê!*
*Lê wisa bi hêrs e qet nepirsin, ku kapîtalîzmê jî vê hêrsê bidîta, teqez wê têk biçûya...*

***

*Hevalên goşthêz û vejeteryanên delal,*
*Hefteyek berê min twîtek dît, di vê twîtê de mizginîya dahênekekê, kapîtalîzm nû dikir! Lewma ev meseleya Miheme hat bîra min...*


*Li Îngîlistanê şîrketek, nebixêr, ji bo patronan tiwaletek nû amade kiriye! Li gor vê dizaynê tiwalet 13 dereceyan xwar e! Ji ber vê yekê karker nikarin ji 5 deqîqeyan zêdetir bisekinin di tiwaletê de. Heke zêde bimînin wê çîmên wan biêşin... Hûn dibînin ne wilo? Ev kapîtalîzma bê îman dest diavêje çi! Rehetî tune ji me re... De ka were safî bike! De ka were hêrs nebe!*

*Wekî ku tê dîtin, wellehîn tiştekî ku kapîtalîzm dest nediyê û sûd jê negire tuneye.*
*Li xwe miqate bin!*
*Kapîtalîzm bizinê ji me dikire bi heftan, hiriya wê difiroşe me bi heyştan.*
*Dawiya dawî Miheme mafdar e!*
*Kapîtalîzm adîî ye....*





13 degree sitting angle causes leg strain after five minutes


www.arshivakurdi.org



ZAROKÊN NEMRÛD
MAMO
ZIVISTANA VIRA DIJWAR E. HELE JI BO ZAROKÊN KU BI QASÎ MAÇA YARA XWE HEZ JI HILATINA ROJÊ DIKIN, ZIVISTAN DIJWARTIR E. EV SERMAYA KU TU KEVIR BÎ Û BIDE DILÊ TE JÎ GAVA XWE LI NEMRÛDÊ DILEFÎNE, SERDÊR MÎNA ÇÛKÊN MUHACIR WINDA DIBIN. EM GIŞ DIZANIN, SERMA HEZ JI KESÊN BI TENÊ DIKE.
DI DI DI... DIQEFILIM LAWO DIQEFILIM. BI ÎMAN NIGÊ MIN PÛÇ BÛNE, BI HAWARA MIN DE WERIN OXLIM!
AHA AHA HA HA!
WÎÎÎ! MA NE JI BERA JÎ NIGÊ MIN TUNENE. EHE EHE!
XWEZÎ NE NIGÊN TE LÊ SERÊ TE TUNE BÛYA. TI... TI... TIII!..
DEV JI SERÎ MERIYAN BERDIN, Ê MIN DIRANÊ MIN TEVÎZÎNE! HÛN DIBÎNIN NE, EM WEK VÎ ÇEQELÎ JÎ NABIN!
EHE EHE MIN JI XWE RE JI BO ZIVISTANÊ QAT LÊ KIRIN. BIQEFILIM JÎ QE NEBE WEKÎ HINEKAN NAFETISIM.
HEQLÎ YE WELE. MÊZE HINDIK MAYE HIN HEVAL BIFETISIN. EHE EHE HE!
MMMG! HIMINIGI.. DNM... MMMGR!
AHA AHA HA HA!...
LAN XELK Û ALEM JI XWE RE DI MUZEYAN DE DISTRÊN, HELA TU LI TIŞTÊN PARA ME KETINE MÊZE. TU XWEDÊ ÎCA MUZEYA VEKIRÎ ÇI YE. OFF OFF! BI XWEDÊ EM BÛN TERRIK Û MAN.
TERES BÎ EZ Ê DÎN BIBIM, BERFA ÇI HALÊ ÇI. LI HER DERÎ GERMBÛNEKE KÛREWÎ, LÊ HELA TU LI TIŞTA PARA ME KETIYE MÊZE. BIRAKO MA QEY EV DER Ê HEWIYÊ YE LO?
PAR DIGOTIN SERMAYA SÎBIRYAYÊ TÊ. GELO ÎCA ÎSAL JI KU TÊ? PÛŞT SERMAYA PÛŞTA!
MA ÇÎ SERMAYA ME HEYE KU JI DERVE TÊ?
DEV JÊ BERDE, JI XWE DERDOR NEXWEŞ E. ÎCA ÇAVÊ TE LÊ YE TU SERÊ MILET TÊKÎ BELAYÊ? ÇAVÊ TE LÊ YE BÊJIN SERMAYA KURDISTANÊ TÊ, NE?



JI KU TÊ BILA BÊ, LÊ NALET LÊ BÊ. MA SERMA Û KEVIRAN BIQERISÎNE?
?!
HEYRANA ÇAVÊ TE HELA TU PÊŞÎ BERFA LI SER SERÊ XWE DAWEŞÎNE. WELE DILÊ MIN DIXELE, EV ÇI YE YAW?!
KA ÇI BIKIM? TIŞTEKÎ XWEZAYÎ YE. TU DIBÊ QEY MIN WEHA KIRIYE! HELA HELA!
HEYYT! MEGER SIMBÊLÊ QERISANDÎ HÊ BIHEYBET DIXUYÊ. PEHH PEHH!
SIMBÊLÊ MIN, AY SIMBÊLÊ MIN ŞIKEST. ÛLAN KÎJAN BÊNAMÛS KURÊ BÊNAMÛSA EW GUL IKA BERFÊ AVÊT?
MIN AVÊT LAN MIN. BES E ÛLAN JI SIBÊ DE WE SERÎ LI MIN KIRIYE TARA BÊJINGÊ!
BINE BINE DI DEVÊ MIN DE HÊ LODEK GULIKÊN BERFÊ HENE! WELEHÎNÊ KÎ DEVÊ XWE VEKE EZ Ê BÊM ŞÎPELEQ. HUŞ BIN YAW!
BER BI JÊR VE, HINEKÎ DIN JÎ...
ZA..ZAZA..ZA
KART... KURT...KÛRT!..
NIGÊN XWE BI XWE RE KAŞ NEKE BIMEŞE LAN. MEŞA ZAZAKÎ ÇI YE ÎCA? 'BOLÎCÎTI YÊ' MEKE!
KART! KURT KÛRT!
ZAZA.. ZAZA..
TU BI MEŞA 'KART KÛRT KURT' DIMEŞÎ NABE 'BOLÎCÎTÎ', ÎCA A MIN DIBE 'BOLÎCÎTÎ' HE?
ZA..ZAZA..ZAZA..
TEMAM TEMAM, EM SERÊ XWE NEK IN BELAYÊ, A BAŞ EM LEKANÊN XWE DERXIN.
WELE TU RAST DIBÊJÎ ABÊ!
ZAZA.. ZAZA..
TÎRK! TÎRK!
TÎRK! TÎRK.. TÎRK!
ABÊ... WELE BI VÎ HAWÎ JÎ TU DIBÊ QEY EZ ESLÊ XWE ÎNKAR DIKIM. LI ZORA MIN DIÇE YAW!
NA NA BAŞ E BAŞ. DENG MEKE VA EM HATIN!!
TÎRK.. TÎRK!
NE EHMEDÊ XANÎ, NE JÎ DUZGUN BABA TU KES NEMA EM NEÇÛN CEM WAN JI BO DERMAN!
TU BIÇE, EZ Ê LI VIR BIM!




www.arsivakurdi.org



# TERSTAQLA RECO

## Gedên Nînja

Hin kes dibêjin dîn kêmaqilin û tiştan zû ji bîr dikin. Dibe ku dînên xelqê weha bin hema dînên Amedê tiştkî jî ji bîr nakin. Ew biaqilên me hene ya, qaşo ew biaqilên me, ew ji bîr dikin lê dînên me qet ji bîr nakin. Wexta gede bûm, li Baxlera Amedê Fetoyê dîn hebû. Feto, wek Hîkoyê ku her kes wî nas dike, serşimamokî bû. Lê mîna Hîko bûrjûwayekî biçûk nebû. Feto kedkar bû. Hîko dide dû cixareya belaş, lê Fetoyê me, pêlav boyax dikirin, bi perê xwe cixare dikirî.

Feto, qasî 5 sala ji min mezintir bû. Qama wî pirr dirêj bû. Wexta me û zarokên mehla din şer dikir, Feto canfîdayê mehla me bû, tim li pêş bû. Pirr qawetlî bû, dîtin û gotin nabe yek. Kevir dizîzikandin. Kevirên ku wî davêt ji mehla me diçûn mehla din. Yanî hew qasî bişid davêt.

Rojekê hevalê min î mehlê Weyso hat, go "Reco, tu dixwazî bibî nînja?"

Mi go "Ewên ku ji ser darekê difirin ser dareke din?"

Go "Erê".

Mi go "Ma kî naxwaze wûla?"

Go "Em dersa qûngfûcî digrin, dixwazî tu jî were?

Mi go "Errikkk îja qûngfû jî heye! Ka? Li ku ye?"

Ji hêcana hindik mabû qelbê min ji qefesa singa min xwe bavêje derva û zîtikan bavêje Weyso. Wexta Weyso dît bihêcan im, go "Li Qoşiyoliyê, Feto ders dide me. Îro dersa dûmanderxistinê û jiholêwendabûnê heye. Hadê em biçin".

Mi go "Hadê em biçin. Piştî dersê em fîlmê Brûcele temaşe bikin û paşê jî tetbîqatekê bikin".

Wê demê li Qoşiyoliyê park mark tune bûn. Aresekî betal û beyar bû. Li wir, ciwanan ji xwe re bi topê dileyst û li areseya niha di nav Batîkent û Qoşiyoliyê de dimîne jî qenaleke mezin hebû. Bêhna gû jê dihat. Ji bêhna me nikaribû biçûna wir. Lê pozê me elimîbû wê bêhnê. Heta weha bibû ku wexta rojekê jî em neçûna, me bêriya wê bêhnê dikir.

### Stêrka nînja ya bijehr

Em çûn meydana Qoşiyoliyê, min mêze kir li nav wî erdê qerase ti kes jî tine. Lê hema li nêzî qenalê 6-7 kes rûniştine.

Weyso go "Hadê bazde, hindik maye ders dest pê bike".

Em bi bazdan çûn cem wan. Feto li orta zarokên mehlê civatkî rûniştiye, zarok jî mîna wî rûniştine.

Feto, her du destên xwe li ser sînga xwe daniye ser hev, mîna hosteyên qûngfû ê Çînî qonsantre bûye. Weyso, hêdîka go "Sensey, Reco jî dixwaze tevî dersan bibe".

Zarokên rûniştî gotin, şşşş. Em jî hema hêdî hêdîka rûniştin. Ez jî civatkî rûniştim û min her du destên xwe li ser sînga xwe dan ser hev. Min çavê xwe girtin, qaşo qonsantre dibim.

Ji xwe re xeyalan çê dikim. Li terasa bînaya cînarên me ketime pîneya kevokan. Hema çi qas kevokên teqlecî, atlas, narincî, zeytûnî, cigerî hene radihêlim gişan. Ay lo lo hayê kevokbaz Bozo abê ji bayê felekê tineye. Ji xwe bibîne, xwedê wekîl wê min ji jor de bavêje xwarê. Ez bi asansorê danekevim. Ji ber ez nînja me difirim ser bînaya li kêlekê û ji wir xwe bera jêr didim.

Ez weha ji xwe ve çûbûm, ji nişka ve Feto go "Niha jî bila her kes li min mêze ke. Bîskek din wekî ku mij belav bibe, ez ê winda bibim". Ji hêcana dikim bifirim. Dewam kir û go "Çawa min toz û dûman rakirin, hema hûn jî çavê xwe bigirin. Ê ku negre ez ê stêrka nînja bavêjimê û wê di çavê wî re biçe. Paşê bira diya we neyê ji diya min re tişkî nebêje, temam?!"

Me têva go "temam sensey". Feto qasî 20 metrî dûrî me çû. Xwe ber bi erdê ve xwar kir. Li derdorê çi qas toz hebû xist kefa destê xwe û go "Heyyt hararî wakonîkî hahooo". Toza di kefa destê xwe de li derdorê û ber bayê xist û qîriya go "Ez çavê kî vekirî bibînim heye ya, ez ê stêrka nînja ya bijehr bavêjim wî û çavê wî kor bikim!"

Ji tirsa me teva serê xwe bera ber xwe da. Lê ez pirr jî meraq dikim. Min di dilê xwe de go "Law Reco ma tu yê çi bikî ji du çavan. Hema çavekî xwe veke, stêrka nînja tê re biçe jî qe nebe çavê te yê din saxlem e". Walla min bi dizî çavekî xwe vekir. Hahooo! Min dî ku hê jî Feto li meydanê ye.

Li bendê me winda bibe, lê ne winda dibe ne jî tiştek diqewime. Bi bazdan hat li cihê xwe rûnişt.

Go "Niha hûn dikarin çavên xwe vekin". Ji tirsa nikarim bêjim, "Min te dît, tu wenda menda nebûyî, bi bazdan hatî cihê xwe".

Li kêleka wî ya rastê ji dêvla şûrê nînja çoyek heye. Stêrka nînja di çavê min re neçû, lê kesin ê wî çoyî di serê min de bişkîne.

Her kesî go "Ehewww tu çawa hatî vira?"

Weyso go "Te dît Reco? Qasek berê taaa li wir bû, ji ber çava wenda bû û ji nişkave li vira xuya kir".

Mi go "Erê Weyso mi dît. Ez jî di şoqê de me".




www.arsivakurd.org

**Ez ê jî wenda bibim**

Min destê xwe bilind kir, min ji Feto re go "Sensey, ez jî biceribînim?"
Go "Tu hîn ecemî yî. Tu yê wenda bibî. Heger duaya vegerê nizanibî, tu yê nikaribî vegerî nav me ha!"
Mi go "Çawa yanî, qey duaya vegerê jî heye?"
Feto go "Heger tu nebêjî hilo bilo tew lolo, tu ê nikaribî vegerî".
Mi go, "Temam sensey, ez niha biceribînim?"
Go "Hadê wenda bibe".
Ji cem wan çûm. Lê difikirim, heger perwerdehiyê di nîvî de bihêlim wê Feto li min bixe. Min xwe bi xwe go, a baş hema prêzetiyekê bikim û qaşo wenda bibim, xwe bera qenalê bidim û ji wir ber bi jor ve baz bidim, dû re ez ê bêjim vinnn berê xwe bidim malê û ji xwe re fîlmê Brûcele sêr kim.
Mi go "Heger hûn hazir bin ez ê dest pê bikim sensey".



Feto go "Temam, dest pê ke".
Min kefa destê xwe tije toz kir û bi dengekî bilind go "Heyyt hararî wakonîkî hahooo".
Min toz bi ser serê xwe ve belav kir û hema ber bi qenalê ve reviyam û min xwe avêt qenalê.

**Qenala gû**

Min xwe di qenalê wer kir lê... meger qenal tije gû bûye. Tewaleta Baxlerê giş diherike wir. Bêhna gû ji qenalê dihat, lê min nizanibû bi vî awayî. Heta çokê di nav gû de mam. Heger min di vî halî de bibînin ez ê rezîl û rûswa bibim. Min go, Reco bazdeee. Her ku çindikan didim xwe, lapeyên gû wek berfê dibare diyarê serê min.
Lê li gor wan ez wenda bûme û nizanin ez li ku me, qaşo min nabînin. Diqîrin dibêjin "Recooo Recooo bes e hadê derkeve". Dengê Weyso tê min, dibêje "Recooo acele duaya vegerê bixwîne!"
Yekî din dibêje "Recoo bêje hilo bilo wilo tew lolo".
Lê min jî qedera xwe daye ber çêr û xebaran û direvim.
Pir reviyam. Paşê ber bi jor ve çûm. Her derê min lewitiye, bûye gû. Bi wê hinc û rika di nava xwe de min go, Feto Fetoo!
Gişa li min mêze kir. Mi go, "Fetooo, ez diya te nimmm!"
Tabî wê çaxê dijûnên cinsiyetparêz ne qedexe bûn. Heger qedexebûya jî haya min jê çê nebûye.
Feto go "Nînjano acele stêrkan bavêjin, Reco bûye samûray". (Li gor efsaneya mehleya me nînja û samûray dijminên hev in. Mêr ji hev kuştine)
Çawa Feto weha go, min fam kir ku wê serê min bişkînin. Wekî stêrka nînjayê keviran davên min. Hema çi qas hêz di min de hebû bi qeweta dawî ber bi malê ve beziyam. Qederekê ji wan dûr ketim.
Dûr ketim lê min hesabê Feto nekiribû. Qasî 170 metreyî dûrî min bû. Gomeyek avêt min, li orta paşka stûyê min xist. Ber çavê min tarî bû, li ser serê min stêrkên nînja çirisîn û wekî din tiştek nayê bîra min.

**10 sal şûnde...**

Êdî ez bûme qadro. Li çolê sizme, li metrepolan tiştên qorsan filan virde û wêde diqewimin. Neyse, em zêde nedin nav. Rojekê ji qadên din hin heval hatin bûn mêvanên min. Ez wan dibim mehlên herî radîqal. Her ku çav bi dilsozî û girêdayîtiya girseyê ya ji bo min dikevin, heyran û matmayî dimînin.
Em li taxên Baxlerê digerin. Kî min dibîne dibê "Reco heval, ez bi wê meseleya te ji min re go eleqedar dibim".
Yekî din dibê "Reco heval, krokiya wan cihan temam e. Niha gûzergaha ji bo paşvekişandinê amade dikim".
Ji hemûyan re dibêjim "Hûn ê paşê rapora dorfireh ji min re bişînin, serkeftin".
Forsa min 1500.
Ji ber gera li mehlan em betilîbûn, min go "Hadê em biçin qehwê çayekê vexwin".
Em ketin hundirê qehwê. Çaya me hat, em çayê vedixwin. Min qadroyê Dêrsimê û Botanê dane ber rexneyan, ji ber ku nikarin li gor ruhê pêvajoyê tev bigerin. Ji xwe qadroyê Mûşê nikare li nav çavê min jî mêze bike.
Wê kêliyê hema min dît yekî go "Abê, pêlava te boyax bikim, begem nekî bila belaş be".
Bêyî li ser çavê wî mêze bikim, mi go "Na, sax bî birayê kekê xwe".
Go "Ev deng...?"
Hinekî ma sekinî, go "Bi Qur'an tu Reco yî".
Min lê mêze kir, min ew nas nekir.
Mi go "De hadê boyax ke".
Li hevala fitilîm, mi go "Va li ber çava ye, dînên vira bi xwe jî kedkar in. Gere em her kesî daxilî nav hilberîna şoreşgerî bikin".
Go "Qey te ez nas nekirim? Kuro, ez Feto Feto. Te dît tu ketibûyî qenala gû û qaşo ji ber min direviyayî û min jî gomeyek li nav serê te xistibû û tu hefteyekê di qomayê de mabûyî".
Mi go "Her hal te min şiband kesekî din".
Go "Şibandina çi yaw! Ji ber tu di nav gû de mabûyî, ambulansê jî te qebûl nekiribû, te bi traktorê biribûn nexweşxaneyê".
Bi ser vî halî de qicix qicix jî dikene. Ji bo mêvanê min pê nehesin, mexsûs min go "Herê birayê kekê xwe herê, dînê xelqê şîva do êvarî nayê bîra min, lê ê te bêhna gûyê 10 sal berê tê bîra te". Ez jî qicix qicix keniyam.
Pêlava min havêt, go "Ez pêlava te boyax nakim, niha hundirê wê tije gû ye".
Nikarim tiştkî jî bêjim. Xwêdana cemidî di min re avêt.
Ez û hevalan ji qehwê derketin. Gotin, "Hadê mehlên din jî nîşanê me bide".
Mi go "Yaw de dev jê berdin lo, hemû wekî hev in ji xwe, hadê em biçin Sûrê".
Ji wê rojê ve ji tirsa Feto min hew kes bir Baxlera.





www.arsivakurdi.org




www.arsivakurd.org


BAVO?
BÊJE RUHÊ MIN!
HÎN JÎ TE JI MIN RE BEHS NEKIRIYE...
TU QALA EW ÊN EZ XISTIM VÎ HALÎ DI KÎ?
MIN GOTIBÛ, LI BAXÇEYÊ HEYWANAN QEWIMIYE... MIN... TU DIBÊ QEY MIN BAWERÎ NEDAYE MAKEŞEMPANZEYÊ... JI NIŞKA VE HICÛMÎ MIN KIR...
LÊ WISA BEHS DIKE, DERBÊN XWARINE PIR NAŞIBIN ÊN HEYWANEKÊ BÎRCAN XANIM!
JI BO ZABITNAMEYÊ, DIVÊ EM BI RASTIYÊ ZANIBIN. AN WÊ HEVJÎNÊ TE BÊJE..
AN JÎ...
EM GELE CARA BI QEWMÎNÊN KU RASTIYA VAN BÛYERAN VEDIŞÊRIN RE RÛ BI RÛ DIMÎNIN...
..Û HEGER EM HEL NEKIN, HEMA EM JI HEV RE RAST BÊJIN EM Ê POLÎSAN TÊXIN DEWRÊ!
BINE, NEBÎ NEBÎ TU BIÇÎ CEM POLÎSAN!! EZ Ê RASTIYA VÎ ÎŞÎ HÎN BIBIM, BI AWAYEKÎ EZ Ê HÎN BIBIM, LÊ HEGER TU BIÇÎ...
ÊÊÊ... UZRÊ XWE DIXWAZIM, JI NIŞKAVE XERIQÎM! TE HEYATA KEÇA MIN XELAS KIRIYE...
NA, NE XEM E! BAŞ DIZANIM, ROJÊN ZEHMET IN. LÊ EZ Ê LI BENDA BERSIVA TE BIM. TEMAM?


SERÇAVA, LÊ MADEM WIHA...
KA JI TE RE ÎSPAT BIKIM...
EV ŞEMPANZEYÊN ME YÊN NORMAL Û SAXLEM IN!
PIRRRRRRRRRR
AHAA, WA TU DIBÎNÎ, ÇAWA EM DERÎ VEDIKIN BAZ DIDIN DIREVIN!
CA TU XWEDÊ HALEKÎ WAN Î KU XESAREKÊ BIKIN HEYE?
MA MIMKIN E KU EV ŞEMPANZE HAŞIM TÊXIN WÎ HALÎ?
..JI XWE MALBATA KU EW BEHS DIKE NE LI VIRA YE! WER EM BIÇIN CEM WAN
AX HAŞIM AX!
AHA! VA YE MALBATA KU HÛN DIBÊJIN ÊRÎŞ BIRINE SER HAŞIM!.. BÊJE TU XWEDÊ BÊJE MA HALEKÎ WAN Î KU KARIBIN DESTÊN XWE RAKIN HEYE?
?
ÇI BI WAN HATIYE? AX MALA MINÊ, NE NEXWEŞ BIN?
LI GOR TETKÎKÊN BEYTAR, HER DU JÎ JEHRÎ BÛNE!
ME DI NAV FÊKIYÊN KU TÊJIKÊ XWARINE DE MAÎTOTOKSÎN DÎT.
TU DIBÊ QEY HINEKAN XWESTIYE HÊDÎ HÊDÎ BIMIRIN!
MAKA WÊ JÎ HEMAN FÊKÎ XWARINE Û EW JÎ WIHA BÛYE. LÊ REWŞA WÊ NE PIR XIRAB E.
LÊ REWŞA TÊJIKÊ... PIR NEBAŞ E
?!!
TU BI XWEDÊ KÎ BES, BES TIŞKÎ BÊJE!!! TEXMÎN DIKIM, KÊ KIRIYE Û JI BO ÇI KIRIYE...


LÊ DILÊ MIN QIYAR NADE ÊDÎ WÎ SÛCDAR BIKIM. EV TIŞT HEMÛ JI BIN WÎ XOCEYÊ AQILBERDAYÎ DERKETINE. HEGER BERAMBERÎ JIYANA KEÇA MIN KEFARET NEXWESTANA...
..BELKÎ JÎ KEÇA MIN BAŞ BIBÛNA... WÊ EV HEYWANÊN KER Û LAL Û BÊGUNE JÎ BAŞ BÛNA. LÊ HIN KES KETINE BIN WÎ, AQLÊ WÎ ÇELQ KIRINE...
...KÎ EW ŞANDIBE CEM XOCE, LI SER BELAYA XWE VEBE...
TEMAM TEMAM
ÊÊÊ.. EZ Ê VAN TIŞTAN BI HAWAKÎ SERERAST BIKIM. KA BÊJE JI BO HAŞIM ŞANSEK HEY TUNEYE?
MIN JÎ DIXWEST LI SER VÊ XEBER BIDIM
?
KARÊ MIN Û HAŞIM BAŞ BÛ. ŞERT Û MERC ÇI DIBÛN BILA BIBÛNA, ROJEKÊ JÎ NEHATIYE BÎRA MIN KU DEV JI WÎ BERDIM. LÊ PIŞTÎ VÊ REWŞÊ DEHÊDÎ NIKARIM PÊ RE BIXEBITIM!
NO NO, MEKIN WIHA MEKIN!! HEGER EV KAR JÎ JI DEST BIÇE, WÊ XWE PIR BÊKÊR HÎS BIKE...
..MEKIN, WÊ EV BI MIRNA WÎ BE... AXX...
KKHHHH..H
ÊÊ... BIBORIN...
TEMAM, EZ DIZANIM EZ Ê ÇI BIKIM


HEFTEYEK DI SER RE DERBAS BÛ.
HEFTEYEK DIN JÎ...
Û HEFTEYEK DIN JÎ DERBAS DÎBE.
HHORRRMM...
CIYYK..IYKR..CIY..
KLINNK
FERMO?
?!!
EZ.. ÊÊ?
BELÊ!?
E..NAVÊ MIN BÎRCAN...
TEMAM, BIHÊLE BIRA WER HUNDIR!





wê dewam bike

Îmam Cîcî nivîsand

# ZAGOR
# EW QEHREMANÊ LI BER ŞERMA BAVÊ XWE RABÛYÎ



1970-Berga hejmara ewil a ji Weşanên Tayê derketiye.




Gava ew zarokê ku qalikê zebeşan ji heqîba li ser milê xwe derdixist û digot "Ahyaaaak" û qalikên zebeşan davêt hevalê xwe... Gelo ev dîmen çi dianî bîra gelê Çewlîgê? Helbet niha fêm kirine ku ev lîstikeke şerî ye. Lê bi ya min li wê tewşîkî mewşikiyê tu wate bar nekirine. Ma wê ji ku bizanîbana ew qîrîna seyr û ecêb a qehremanekî xêzeromanê ye? An jî ji dêvla balteyê keviri qalikên zebeşan dadikirin? Ma wê ji ku bizanîbana qehremanên ku gelek caran hewl dane ew balteyê kevirî yê kevnare çê bikin, lê ji heq derneketine? Ên hebikekî şubh pê xistibin jî, di pekandina ewil de bi xembarî bûne şahid ku ka balteyên wan çawa li erdê ketine û bûne kafirkeratî.

Em zarokine wisa bûn ku ne ji ekranên biçûk an jî ji ekranên mezin, bi saya cîhaneke dubûut a xêzeromanê me qehremanên wan nas kirin. Ji ber vê yekê piraniya qehremanên me yên ewil hem bêbûut hem jî ne dorfireh bûn, karakterine hêsa bûn. Nizanim belkî jî em bi qasî ku qehremanên xwe fêm bikin ne xwedî tecrûbe bûn. Madem em bi qasî ku êdî qalikên zebeşan navêjin mezin bûne, nexwe em dikarin ji nû ve qehremanên xwe nas bikin, ne wisa?


Navê qehremanê me Zagor e. Sergio Bonelli û Gallieno Ferri, di sala 1961'ê de bi hev re afirandine. Li gorî gelê Çermsor jî Zagor Te-Nay e. Di zimanê Çermsoran de "Te-Nay"; Yezdanê Bibalte ye. Bûyer, di sedsala 19'an de li bajarokeke xeyalî ya Amerîkayê, li daristanên bajaroka Darkwoodê diqewimin. Zagor, kesekî qamdirêj, por reş û kurs, çeleng, birûpêl, masûlkedar, bi hêz û quwet û çist e. Gomlekekî sor î bêmil û resmê eyloyan (qertel) li ser heye. Her çi qas tu wateyekê li wan rîşikên li kêleka gomlekê wî yên bi ser milên wî yên tazî ve daliqîne bar nekim jî, lê girîngiyê bi sembola eyloyê didim. Lê kifş e, bi îmaja eyloyê ku ji bo civakên pirxwedaperist tiştekî pir xusûsî ye, xwestiyetesîreke mezin li Çermsoran bike û wekî sembola otorîteyê bi kar bîne. Mesela di Tex de jî heman rêbaz bi kar aniye û navê Eyloyê Şevê û heman sembol bi kar aniye.

Li kêleka rastê ya qayîşa wî balteyekî




Yezdanê Bibalte Zagor, hela bêje ev çi ye?

kevirî yê gilover bi benikan ve bi şivekê hatiye girêdan û li kêleke wî ya çepê jî demançeyeke bitopik heye. Balte, çekeke kevnar a Çermsora ye; demançe jî çekeke nûjen a çermspiya ye. Zagor, bi vî awayê çekgirêdanê dixwaze rola xwe ya terazîner a di navbera her du çandan de bide ber xwendevana. Tişta ji rîşikên gomlekê wî jî bêwatetir, pantorê wî yê teng î şîn e ku dawiya qûna wî gilover û spî ye. Di şer û lecên herî bi hêcan de jî ew pîneya spî li ber çavê me dikeve. Lê belê hê jî em nizanin ew pîne ji ber çi bi wir ve hatiye vekirin.



www.arsivakurdi.org




**Zagorê biçûk, ligel Fitzyê Nêçîrvan li ser gora malbata xwe.**

*Lê em dev ji bejnûbala wî berdin û berê xwe bidin destpêka çîroka efsaneya Zagor; Berî ku navê Zagor lê bê kirin, navê wî yê ewil Patrick Wilding e. Tevî malbata xwe ya ji Îrlandayê, li daristanekê bi bextewarî dijî. Hê gava zarok bûye bi pêşengiya çermspiyekî bi navê Salomon, Çermsorên Abenakî êrîşê dibin ser mala wan û dê û bavên wî dikujin. Lê bavê wî, berî ku bê kuştin Patrick davêje çem. Nêçîrvanê bi bernavê Fitzy, Patrickê êtim ji çem xelas dike û wî wekî şervanekî mezin dike. Gava Patrick, dibe ehlê şoxulandina çek û balte û bi qasî ku karibe heyfa xwe hilîne mezin dibe, qebîleya Abenakî ku malbata wî kuştibû dibîne û gişan dikuje. Şefê*




**Gava Zagor, bi wê qîrîna xwe ya ecêb aqil ji serê Çermsoran dibe.**

*qebîleyê Salomon, berî ku bimire li xwe mikur tê û ji Patrick re dibêje, bavê te leşkerekî kuştarê Çermsora bûye û loma ew kuştine. Di êrîşê de Fitzy dimire. Zagor, dîsa êtim dimîne û bi rêyan dikeve. Û malbata Sullivan nas dike ku ev malbat malbateke cambaz e. Ji Sullivanan dersên akrobasiyê, navê Zagor û gomlekê xwe yê sor î resmê eylo li ser digire û diçe serdana Çermsorên Darkwoodê. Bi hin lîstikên dûman û ronayiyê tesîrê li Çermsoran dike û dike ku Çermsor jê bawer bikin ku nîvxweda ye. Bi vî awayî navê Zagor Te-Nay lê tê kirin û dibe parêzgerê gelê Çermsor.*

*Helwest û nêrîna kolonyal a xêzeromana wê serdemê di vir de jî xuya dike; Çermsor, bi qasî ku nikaribin xwe bi rê ve bibin cahil û hoveber in, pêdivî bi pêşengtiya çermspîyekî dibînin. Ji xwe Salomonê ku malbata Zagor kuştibû jî pêşengekî çermspî bû. Bi qasî tê fêmkirin Zagor, ji ber ku kurê bavekî kuştar e û ji vê kirina bavê xwe*

**Çîko**



*şerm dike, ji bo ji vê şermê xelas bibe dibe parêzgerê gelê Çermsor. Wisa xuyaye nivîskarên wî qîma xwe bi vê jî neanîne û ji bo Zagor hesab bi bavê xwe re bibîne, radibin serpêhatiya bi navê "Zagor Li Hemberî Super Mike" dinivîsînin. Di vê serpêhatiyê de, Zagor û zilamekî hêzdar û atletîk ku mirov dibê qey ji nav xêzeromanên Amerîkî derketiye, li hev didin. Li ser vî zilamê ku dixwaze teqlîdê Zagor bike û şûna wî bigire, gomlekek heye û li ser sînga wî tîpa M heye. Navê qehreman Super Mike ye. Hela li vê tesadufê mêze bikin; navê bavê Zagor jî Mike ye. Musabeqeya wî û Super Mike, li ber çavê Çermsoran pêk tê û Zagor têk diçe. Musabeqeya wan a dudoyan, bi şahidiya heyeteke ji efserên artêşê pêk tê û vê carê Zagor Super Mike têk dibe. Super Mike, her çi qas bi hêla xwe ya fizîkî neşibe bavê Zagor jî, lê egoya wî ya alterî ye. Zagor, di vê serpêhatiya xwe de li ber çavê kesên fermana kuştinê dabûn û mexdûrên kuştinê, bavê xwe têk dibe û hesabpirsîna xwe pêk tîne. A rast ev musabeqe û leqayîhevhatin, di asasê xwe de merasîmeke pakbûn û paqijbûnê ye.*

*Ji ber bikostum (bicilûberg) e nêzî terzê qehremanên xêzeromana Amerîkî ye, lê di asasê xwe de tam karakterekî xêzeromana Îtalî ye. Celebekî durehî (qirma) ye. Vebêjiya ku bi awayekî klasîk î western dest pê dike, di serpêhatiyên din de dibe ku veguhere celebên tirs, fantastîk, honaka zanistî û komediyê. Ji bo parastina aştiyê geh kulmên xwe geh jî çekên xwe dişoxulîne. Gava vê yekê dike jî nabêje ev çermspî ye an jî xwecihî ye. Heger di navberê de oqyanûs tunebe, sekin jê re tuneye ji vir diçe wir ta ku bigihê cihê xwe. Bi zêrên li qeraxên çeman berhev dike, debara xwe dike. Wekî qehremanên xêzeromanên serdemê hemûyan, têkiliya wî ya bi jinan re jî ji maçeke şermoke wêdetir nîn e. Di heyata wî de gelek jinên xweşik hene, lê di dawiya her serpêhatiya xwe de bi dostê xwe yê şîşko yê Meksîkayî berê xwe dide qulûbeya xwe.*

*Di çirava li Darkwoowê de, tevî dostê xwe cirxweş Çîkoyê şîşko li qulûbeyeke nekonfordar dijî. Çîko ku ji xeynî xwarinê tiştek nayê bîra wî, keseke sadiq, îtaetkar, tirsonek û bêkêr e. Bi van xusîsiyetên xwe tenê unsûreke komediyê ye. Di helkirina bûyeran de ne xwedî roleke tesîrdar e. Ev kesê Meksîkayî ji bo wekî Çermsoran bijî, pêdivî bi vî çermspiyê Îralndî, yanî bi Zagor dibîne. Hevalên Çîko jî eynî wekî wî ne an bêkêr in an jî bibela, ecêb û komîk in. "Billê Bêr û Tevir" ku tim li*

***Zagor li hemberî Super Mike***



*xezîneyan digere, postecî Drunky Duck ku nameyan tîne qulûbeya wan î li Darkwoodê?!. Bise bise, deqakê?!.*

*Drunky Duck. Dêmeg navê postecî werdeka serxweş e ha?.. Himm.. Hela em lê hûr bibin: Zilamê me li qulûbeyek di nav çiravê de, tevî Meksîkayiyeke qamqutik û komîk dijî. Bi balteyekî kevnar, gomlekekî sor*




**Bi ya min bilûra di dest Drunky Duck de ne vala ye.**

*î birîşik û pantorekî pişt qûna wî bi pîneyên spî û ji wir diçe wir. Bi ser de bi awayekî tewşomewşo diqîre, dibêje "Ahyaak" û xwe wekî nîvxweda dibîne. Ji xwecihiyan bigire heta rêbiran, ji xwînmijan heta şeytanqûniyan, ji eşqiyayan heta fezayiyan gelek dijminên wî hene. Tenê seredanekî wî heye ew jî posteciyê bi navê werdeka serxweş e. Ma hûn dibên li vê çiravê ev qas dijminê wî çê bûne? Ez dibêm Werdeka Serxweş torbeciyê Zagor e. Aha! Me bi salan çîrokên ku ji serê bidûman ên du hevalan derketine xwendin. Gelo ma wekî din tu îzahiyateke vê ecêbiyê heye?*




***Ev jî Çîkoyê Îmam Cîcî***


www.arsivakurdi.org




www.arsivakurdi.org





www.arsivakurdi.org






www.arsivakurdi.org



DAYÊ, TU XWEDÊ TU ÇI DIKÎ HÛÛÛ? ÊRA TU JI KÊ ELIMIYÎ VAN TIŞTAN?
HMMM, XWEŞ BÛ. LI DERDORÊ JÎ ÇEND HEB DARA DEYNIM Û AVA KANIYÊ JÎ EYAR BIKIM, TEMAM E.
MIR.. MIR... MIRRRR.... EL FAAATIHA...
HADÊ HURME, LI ME BÛ ŞEV. ANCAX EM BIGIHÊN MALÊ, ZÛ...
BI XWEDÊ LI VAN DERAN ZIYARET MIYARET TUNE BÛN HEVAL. MA EZ ZANIM, ZAROKATIYA MIN LI VAN DERAN DERBAS BÛYE. EW XOCEYÊN SEXTEKAR HENE YA EW XOCE, HEBE TUNEBE EV FIHÊLÊ WAN E. WÊ RÛNÊN, JI XWE RE QUR'AN Û YASÎNAN BIXWÎNIN Û HAŞA HIZÛR MILLETÊ EHMEQ JÎ PERE Û GOŞT MOŞTÊ QURBANA BIDE WAN. SEXTEKARÊN SEXTEKAR!.. XWEDÊ ZANE BELKÎ DI BIN AXÊ DE MIRÎ JÎ TUNENE. ERÊ WELE... HELA BIKOLIN, HEGER NE VALA BE EZ BÊDÎN BÊÎMAN BIÇIM HIZÛRA XWEDÊ
HA..HA..HA! TU HEQARETÊ LI GELÊ ME DIKÎ HEVAL. ERÊ EM DIZANIN QÎMETÊ DIDIN ŞÊX Û MELA, LÊ RABIN Û MEZELEKÎ VALA BIKIN ZIYARET... NA NA EV QAS JÎ NABE. HA HA HA!.. ZIYARETA VALA... MA DIBE?
HADÊ HEVAL HADÊ, EV NOQTE NE TÊKÛZ E. GUNDÊ QORÎCIYAN, QEREQOLA JÊRÎN NE BES BÛ, ÎCA BI SER DE EV ZIYARET... HADÊ EM BIMEŞ...

DAWÎ

BUNYAMÎN KARAKOÇ

## RÊYA HÊŞÎN

THE GREEN MILE
1999
(FRANK DARABONT)




## DI TABÛTÊ DE ROVAŞATA

TABUTTA RÖVOŞATA
1996
(DERVİŞ ZAİM)




## RUYÊ BIRÎNDAR

SCARFACE
1983
(BRIAN DE PALMA)




## 12 ZILAMÊN HÊRSBÛYÎ

12 ANGRY MEN
1957
(SİDNEY LÛMET)



## MERHEBA HEVALNO!

JI NIHA Û PÊ VE EV DER RÛPELA AMATORA YE. EV DER WÊ CIHÊ WAN KESAN BE KU DIBÊJIN; PIR XWEŞIK XÊZ DIKIM, JI BERA BERÊ DE XWEDÎ QABÎLIYETEKE DANA XWEDÊ ME, HEGER DERFET Û ÎMKANÊ BIDIN MIN EZ Ê BI TENA SERÊ XWE KOVAREKE WEHA DERXIM KU BIBE KOVARA HERÎ ZÊDE TÊ FIROTIN, YANÎ EV QASÎ ŞAHANE ME. AHA EM WAN KESAN LI VIRA BI CIH DIKIN. TABÎ DÛ RE EM WAN DIFISÎNIN Û DIPIŞPIŞÎNIN Û HEBIKEKÎ JÎ SAKÎN DIKIN. ÇAWA KU EM TIŞTÊN JI AXÊ ÇÊ DIBIN, HETA HINEKÎ PAQIJ NEKIN AN JÎ PÊ NELÎZIN HEMA YEKSER NAXWIN, EM Ê LI VIRA JÎ HEMAN TIŞTÎ BIKIN.
HETA NIHA KESÎ LI DERIYÊ ME NEDAYE, LÊ EM DIBÊJIN HEGER BIKEMILE Û BISTEWE WÊ XWARINEKE PIR BITEHM JÊ ÇÊ BIBE. Û EM Ê HEWL BIDIN KU AXA ME BERÊN WE YÎ HÊJA BAŞ SAZ BIKE Û BIPIJÎNE Û BÎNE ASTEKE SERWÎSKIRINÊ. EM Ê HETA ASTA SERWÎSKIRINÊ WE LI VIRA RAGIRIN.
JI BO VÊ JÎ, TIŞTÊN EM JI WE DIXWAZIN EV IN...



### YEKKK...

LI LÊNÛSKEKE BIÇÛK AN JÎ JI XWE TEKNOLOJÎ PÊŞ KETIYE, LI TELEFONA XWE, LI TABLETA XWE QERF Û YARIYÊN BI DEST WE KETINE BINIVÎSIN. ECELE MEKIN. TIŞTA EWIL HATIYE BÎRA WE, HEMA DI CÎ DE XÊZ NEKIN. TIŞTA EWILÎ HATIYE BÎRA WE, MIHTEMELEN DIBE KU BERÊ HATIBE BÎRA HIN KESÊN DIN JÎ. BISEKININ, BIDIN SER HEV DU.

### DUDOOO...

GAVA WE QERAR DA HÛN Ê KÎJAN QERF Û YARIYÊ XÊZ BIKIN, PAŞÊ MALZEMEYA KU HÛN Ê XÊZ BIKIN HILBIJÊRIN. JI BO VÊ KAXEZEKE GIRAMAJA WÊ GIRAN Û HIBRÊ BELAV NAKE MUNASIB E. A RAST PIR HEZ JI KESÊN DIBÊJIN, PERÊ MIN HEYE ÎCA KARÊ MIN TUNEYE SERÊ XWE BI KAXEZÊ RE BIÊŞÎNIM, NAKIM. LÊ GAVA HEBE ÇIMA NEBE?

### SISÊÊÊ...

PÊŞIYÊ BI PÊNÛSZIRIÇEKÎ (QURŞÛN QELEM) SERIKÊ WÎ NERM KOMPOZÎSYONA XWE YA HÛN DIXWAZIN XÊZ BIKIN, LI SER KAXEZÊ BI CIH BIKIN. BÊYÎ KU PIR BIDEWISÎNIN PÊŞNÛMAYA (ESKÎZ) WÊ TEMAM BIKIN. EW REŞKIRIN Û ÇIZÛVIZ PÊŞNÛMA BI XWE YE. TE DÎTTT NE WILOOO...

### ÇARRR...

PÊNÛSEKÎ HIBRA WÎ REŞ, DI SER PÊŞNÛMAYA BI PÊNÛSZIRIÇÊ HATIYE ÇÊKIRIN BIBIN Û BÎNIN Û XÊZA XWE TEMAM BIKIN. NAVÊ VÊ JÎ ÇÎNÎ YE. ÇIMKÎ BERÊ HIBRA ÇÎNÎ Û DIVÎT DIHATIN BIKARANÎN. (HELBET NIHA JÎ DIXWAZIM HÛN BI KAR BÎNIN)

### PÊNCCC...

BI QASÎ KU XÊZÊN REŞ ÊN ÇÎNÎ BIMÎNIN BI JÊBIRÊ XÊZÊN PÊNÛSZIRIÇÊ BAŞ JÊ BIBIN. HEGER HÛN PÊNÛSZIRIÇÊ ŞÎN AN JÎ KESK BI KAR BÎNIN NE HEWCEYE HÛN JÊ BIBIN. HÛN BI VÎ HAWÎ JÎ DIKARIN BIŞÎNIN.

### Û ŞEŞŞŞ...

HERÎ DAWÎ JÎ NIVÎSÊN BALONÊ BINIVÎSÎNIN, LÊ HAY JÊ HEBIN BILA NIVÎS BI DERDORA BALONÊ VE NEBIN. ÊDÎ KARÎKATURA WE HAZIR E. HÛN DIKARIN JI VAN NAVNÎŞANAN RE BIŞÎNIN

Fırat mah. 499. sk. yüz evler 39 No:7 AR
KAYAPINAR / DIYARBAKIR
kovarazring@gmail.com

DIBE DI HEJMARA EWIL DE DERNEKEVIN, LÊ NEBÎ NEBÎ BIRA MAHDÊ WE TIRŞ Û TAHL NEBE. BIZANIBIN, HÛN ÇI QASÎ BIŞÎNIN EM Ê EW QASÎ BI WE BAWER BIN KU HÛN DIXWAZIN BIBIN XÊZKAR. PAŞÊ LI VIRA EM Ê BI HEV RE KARÎKATURÊN WE SERERAST BIKIN. JI XWE ÊŞA MEZIN DI DEMA XWENDINA REXNEYAN DE YE. AHA AHA HAHA HA!






DEST Û PÊÇIYÊN TE TERR BIN MAMO! XÊZA TE XURT, QERF Û YARIYÊN TE FAMBAR IN. LÊ BI ÇEND TADAÎLATÊN BIÇÛK WÊ BAŞTIR BIBE. MESELA, ÇIMA ZILAMÊ TEKER DÎTIYE JI ÊN DIN GIRSTIR E? MA TEKER BI QEWETA MASÛLKEYAN TÊ DÎTIN? ÇIMA ZILAM WEKÎ BI DÎREKSIYON BIGIRE BI TEKER GIRTIYE? JI BER DI NAV DESTÊ ZILAMÊ GIRS DE WENDA BÛYE, BAŞ NAYÊ FAMKIRIN. GELO EM KOMPOZÎSYONÊ Û PEVGIRTINÊ BI HAWÎ ÇÊ BIKIN WÊ NE RASTIR BE? EV NE TÊDE, LÊ WEKÎ DIN PIR BAŞ E. HADÊ EM XÊZ BIKIN, BÊWESTAN.

www.arsivakurdi.org

# BETANÎ

MAMO



GAVA MIFTEYA ODÊ DA MIN, BI WÎ RÛÇIKÊ XWE YÊ BÊMAKYAJ KU WEKÎ JOKERAN DIRANÊ XWE CÎQ KIRIN GO, "ABÊ BETANÎ LAZIM E?"

GAVA MIN GO NA Û MIN GUH NEDA PIRSA WÎ, MIN DÎT QÎÇANDINA RÛÇIKÊ WÎ MEZIN BÛYE Û HEMA BÊJE SER ÇAVÊ WÎ GIŞ HEDIFANDIYE.


GAVA ÇÛM ODEYA XWE MIN FERQ KIR KU JI BER WÊ QÎÇBEŞIYA WÎ YA PÎS ACIZ BÛME. DILÊ MIN LÊ XERA BÛ KU TIŞTKÎ CUDA DIBÊJE. BETANÎ ENTER...



HIMM.. PEYVA BETANÎ, JI PEYVA BATTAN A EREBÎ (QATKIRIN, DUQATKIRIN) HATIYE DARIŞTIN.

GELO BI VÎ HAWÎ XWESTIYE BÊJE ÇI? HIMM.. DI JARGONA OTÊLÊ DE PEYVA BETANÎ, DI WATEYA FAHÎŞE, JINA BIKIRÊ DE JÎ TÊ BIKARANÎN?! DÊMEG EV E. BÊNAMÛS, NEMERDÊ NEMERD..

QEHIRANDÎME. GELO JI BER KU HENEKÊ XWE BI MIN KIR AN JÎ JI BER KU JINÊ BÊRÛMET KIR EW QASÎ JÊ QEHIRÎME?




NIZANIM, BELKÎ JÎ SEDEMA QEHRANDINA MIN BI AWAYEKÎ HOVANE GEMARKIRINA BETANIYÊ YE KU HEYBEREKE HERÎ PAQIJ Ê JIYANA ME YE.


GAVA EW BETANIYÊN GIRAN Î BIPIRTIK ÊN ZAROKATIYA MIN Û EW BETANIYÊN GAVA LI MÊVANDARIYÊ DI XEW RE DIÇÛM DIYA MIN DAVÊT SER MIN HATIN BÎRA MIN, PIR QEHIRÎM.

NIHA XWE BÊQEWET HÎS DIKIM. HALBÛKÎ GAVA MIN BETANÎ DAVÊT SER PIŞTA XWE PIR BI RIHETÎ DIBÛM QEHREMANEKÎ BIPELERÎN.

www.arsivakurdi.org



PAŞÊ EW ROJÊN MIN FÎLMÊN TIRSÊ SÊR DIKIRIN HATIN BÎRA MIN KU MIN BETANÎ HETA BER BÊVLA XWE DIKIŞAND Û EZ JI WAN DEHBEYÊN TIRSNAK DIPARASTIM.



WÊ ROJA KU EZ JI MALÊ QETIYABÛM HAT BÎRA MIN KU MIN BETANIYA XWE JÎ BI XWE RE BIRIBÛ Û DI WAN XANIYÊN SAR Û CEMIDÎ YÊN XWENDEKARAN DE BÊ ÇAWA EZ GERM KIRIBÛM.




AHA EZ SALAKEKÎ WIHA ME; GAVA HEZKIRIYA MIN DIGO DIQEFILIM, JI DÊVLA WÊ HEMBÊZ BIKIM MIN BETANIYA XWE DIDA WÊ.



HEZKIRIYA MIN TUNEBA JÎ BETANIYA MIN HEBÛ. JI XWE GAVA HEZKIRIYA MIN HEBANA, TÊRA ME HER DUYAN JÎ DIKIR.




HIMM... EV ÇI YE? JI BER BETANIYÊN BI FERMANA GENERALÊ AMERÎKÎ JEFFEREY AMHERST'Î HATINE BELAKIRIN BI HEZARAN ÇERMSOR MIRINE...



28 KANÛNA 2011- 19 JÊ ZAROK 34 SIVÎLÊN LI ROBOSKIYÊ HATIN KUŞTIN, DI NAV BETANIYAN DE LI KÊLEKA HEV HATINE RÊZKIRIN...



3 KANÛN 2019- LI TIL RIFATÊ 9 JÊ ZAROK 10 SIVÎLÊN DI BOMBEBERANEKÊ DE JIYANA XWE JI DEST DAN DI NAV BETANIYAN DE...



...DIQEFILIM PIR DIQEFILIM. BÊYÎ TIŞTKÎ BIKIM HEMA DIXWAZIM KESEKÊ/Î HEMBÊZ BIKIM Û RAKEVIM.



DAWÎ

MIN TELEFONÎ WÎ KIR, BETANÎ JÊ XWEST. ÇIMKÎ MIN ZANIBÛ CAREKE DIN EZ Ê NIKARIBIM XWE LI BETANIYEKE RASTEQÎNE BIPÊÇIM.


www.arsivakurd.org

# PAŞ SEHNEYÊ

Nivîskar/xêzkar: Kemal Gökhan




MESELA MUHAREM HOSTEYÊ DI FIRINA ME DE DIŞOXULE... KARÊ WÎ YÊ EWIL HOSTETIYA LEHMECÛNA.
KARÊ WÎ YÊ DIN JÎ ÇALAKÎSAZÎ YE!
SE-LAMINE-LEYKIM MUHAREM HOSTE...
ALEYKUMSELAM...
MUHAREM HOSTE HELA JI ME RE HEŞT HEB LEHMECÛNA ÇÊ KE...
GAVA MUHAREM HOSTE LEHMECÛN ÇÊ DIKIRIN, POLÎSEKÎ ÇAV LÊ DIGERANDIN.
PAŞÊ LI NAV ÇAVÊ HEV NERÎN. AXIRÊ POLÎS JÊ PIRS KIR.
MUHAREM HOSTE. DI ÇALA-KIYA DUH DE KESEKÎ KEVIR DAVÊTIN ME.
PIR DIŞIBIYA TE. MAXWENE Ê KEVIR DADIKIRIN TU BÛYÎ?
MUHAREMÊ MIN Û TE ZIMAN GIRAN E...
Ê-Ê-Ê... T-T-TU JÎ ÇAWA DIREVIYAYÎ!
HETA MUHAREM HOSTE LEHMECÛN HAZIR KIRIN LI HÊVIYÊ WÎ MANE...
MUHAREM HOSTE LEHMECÛN PAKÊT KIRINE POLÎSAN JÎ MAHREM HOSTE. LI AMEDÊ HER KES XWEDIYÊ DU KARA YE. LÊ JI XEYNÎ MIN.
KARÊ MIN Ê EWIL ŞANOGERÎ, KARÊ MIN Ê DUDOYAN... DÎSA ŞANOGERÎ... ROJEKÊ DÎSA EM DIÇÛN ÇALAKIYÊ...




ISSN 2687-3567
9 772687 356008 >

www.arsivakurdi.org